 Hjälpmedel Dalarna Delarnas kommuner & Länstinget Dalarna	Sernivis Şirovên li ser şertên deynkirinê		Hejmara dosya LD16/01946
	Kurmanji		Version 8
Alavên alîkarîyê Dalarna Belediyeyên Dalarna & Welayeta Dalarna	Navê dokumentê Şirovên li ser şertên deynkirinê		Tarîxa tesdîqkirinê 2016-05-26
Kurmanji	Yên çêkirîye Annelie Haglind, Linus Nielsen	Qebûl û tesdîq kirî ji aliyê Komîsyona alavên alîkarîyê Dalarna	Tarîxa destpêkê 2016-05-26

Alava alîkarîyê deyne

"LD Hjälpmedel" xwedîyê vê alava alîkarîyê ye ya ku te deyn kirîye. Alava alîkarîyê ji bo şexsê te re hatîye nivîsandin. Ji ber wê yekê tu vê alava alîkarîyê nikari bi deyn bidi kesî, tu nikari bifroşî yan jî bi awayekî din tu wêna wenda bike.

Alava alîkarîyê wek ku du agahdar bûyi bi kar bîn

Bi piranî, rêbera bikaranînê jî bo alavên alîkarîyê hene. Rêbera bikaranînê bixwî û li gor wêna pêk bîn

Tu nikari eyarkirinên sabît biguhere, û tu nikarî alava alîkarîyê bi awayekî din çêke(ave bike).

Ku tu wê alava alîkarîyê li gor ku tu agahdar bûyi bi kar neyne û bi awayekî din bi kar bîne, di wê demê de ger qeza bibe, tu yan jî welîyê zarokan mesûle

Kesê ku ev alava alîkarîyê ji te re nivîsîye dikari li ser pêwîstîya te yî ji bo alava alîkarîyê nîrxandina xwe nû bike. Mîsal ku: dema ku kapasîta fonksiyona te yan jî rewşa mala te bê guhertin, yan jî tû wê bi awayekî din bi kar bînê. Nîrxandinek nû dibe bibe sebeba kû, kesê ji te re ev alava alîkarîyê nivîsîye wêna biguhere yan jî wêna ji te bistîne.

Li alava alîkarîyê baş biner ku ew ji normal zêdetir neyê mehandin

Ji bo ku alava alîkarîyê kar bike gerek bê pakîjîkirin û bi nîzam bê kontrol kirin. Bê alava alîkarîyê çava tê hilanîn gelekî girînge, divê mirov li ser vê jî bifikire.

Ji bo ku alava alîkarîyê kar bike malzemeyên bi kar anînê jêre pêwîstin, mesrefa wan tê bide, misal: pîl (akû), lastîkê tekeran, yên derve û yên hundir ji bo kursîyê bi teker. Mesrefên kar ji bo wan tiştan dikare ji tere were.


Navgîna alîkarîyê biparêz ku wenda nebê

Gava ku alavek alîkarîyê tu li deverêkê ji bîr bikê, bê dizîn yan jî ji ber bê dîqetbûna te wenda bibe, dibi ku tu mecbur be tezmînata wê bide. Alava alîkarîyê li gor sîgorteyê (temînat) wek malê guhêzbar ku mirov ji bo şexsê xwe bi kar tîni tê qebûl kirin. Em tewsiye dikin ku tu li parastina xweyî sîgorteyê binere.

Perê ku tu bidi li gor bê tu kîjan navgîna alîkar bi kar tîne tê guhertin. Fatûre herdem ji te re tê şandin û tu kari bi şirketa xweyî sîgorteyê yan jî bi şirketa neqlîyatê li hev bê. Peymana deynkirinê herdem di navbera te (yê ku deyn dike) û tenduristî- û lînêrîna nexweşan re ye, ev peyman li welayetê yan jî li belediyeyê çêdibê. Ji ber vê yekê fatûrê tenê tu distîne

Bi awayên cuda rapor kirin (teblîx kirin)

- Ku tu alava alîkarîyê li deverêkê ji bîr bike, ku bê dizîn yan jî wenda bibe gerek derhal tu şirketa xwe yî sîgorteyê agahdar bike.
- Ku di veguhastinê de alava alîkarîyê zerarê bibîni, şirketa ku mesûlê vê veguhastinê ye agahdar bike.
- Ku di seyaheta balafirê (teyare) de zerar li alava alîkarîyê bibi, rasterast li wir, şirketa balafira ku tu pê hatîyi (lê swar bûyi) agahdar bike.
- Heger ku navgîna alîkar bê dizîn, îxbarî polîs bik û şirketa xweyî sîgorteyê agahdar bike.
- Têkilîyê bi beşa tenduristîyê -û lînêrîna ya welayetê yan jî ya belediyeyê re deyn, beşa ku ji bo alava alîkarîyê ku berê têkilîya te bi wan ra heye, ji

 Hjälpmedel Dalarna Delarnas kommuner & Länstinget Dalarna	Sernivís Şırovên li ser şertên deynkirinê		Hejmara dosya LD16/01946
	Kurmanji		Version 8
Alavên alîkarîyê Dalarna Belediyeyên Dalarna & Welayeta Dalarna	Navê dokumentê Şırovên li ser şertên deynkirinê		Tarîxa tesdîqkirinê 2016-05-26
	Kurmanji	Yên çêkirîye Annelie Haglind, Linus Nielsen	Qebûl û tesdîq kirî ji aliyê Komîsyona alavên alîkarîyê Dalarna

wan re behs bik bê çî qewimîye. !

Ku alava alîkarîyê kar neke

Dema ku te alava alîkarîyê deyn kir û ew alav kar neke agahdarî berê dani te bê tê li ku miracaeta xwe bike. berî ku tu alava alîkarîyê ji bo tamîrkirinê teslîm bike gerek ew paqijbe. Ku alava alîkarîyê ne pakijbe tê mesrefa paqijbûnê bide

Dema ku tu li dervî Dalarna an jî, li derveyî Swêdê bijî û hewceyî tamîr kirina alava alîkarîyê be , berî her tiştî destûra "LD Hjälpmedel" pêwîste. Telefûnê j "LD Hjälpmedel" re bik. Telefon. +46243-497850
 yan jî e-mail ji maîla wan re bişîn: ldhjalpmedel@ltdalarna.se

Ku ev tamîrkirin li derveyî welatî pêk bê, mesrefa wê tê bide. Ku tu alava alîkarîyê ji bo tamîrkirinê bişîni Swêdê, mesrefa neqlîyatê tê bide.

Ku tu mala xwe bibe devereke din

Dema Ku tu xanîyê xwe yan jî cîyê xwe biguhere, têkilîyê xwe berî wextê wê bi cîhê alava alîkarîyêre deyne û wana agahdar bike ji bo ku tu zanibe bê tu karî alava alîkarîyê bi xwere bibe yan ji nebe

Gava ku mirov mala xwe ji dalana bibe devereke din, Gelek ji wan alavên alîkarîyê mirov nikari gel xwe bibe. Ji ber ku ewana yên wîlayeta Dalarna ne yan jî yên beledîyeya Dalarna ne.

Alava alîkarîyê bi şûnda teslîmkirin

Wek ku tu û kesê ku bi deyn daye te li hev hatini, tu yan jî kesekî din alava alîkarîyê gerek teslîmî wê beşê bike.

- Piştî dema deynkirinê
- Gava ku alava alîkarîyê hew ji tere pêwîst bê
- Ger beş teslîmkirina wê alava alîkarîyê bi şûnda daxwaz bike

Gava ku tu Alava alîkarîyê teslîm bike gerek paqijbe

"LD Hjälpmedel" alava alîkarîyên ku gelekî cî digirin belaş tîne. Mîsal: textên razanê, vîncên şexsî û kursîyên bi teker yên bi elektrîkê (kahrebe) tîni bi kar anîn.

Alavên alîkarîyê yê din tê bi xwe teslîm bikê. ji bo veguhastinê ku alîkarî ji tere pêwîst be, têkilîyê xwe bi "LD Hjälpmedel" re deyne. Tu tenê fiyeta malîyetê dide.

Numra telefonê eve: 0243- 49 78 70

Dikare tu mecbûrî tezmînatê bibe ku:

- dema ku alava alîkarîyê li gor rêbera bikaranînê yan jî talîmatê neyê paqijkirin
- ji xeynî mihandina normal, ku alava alîkarîyê zerarê bibîne
- ji ber bê balkêşbûna te ger tu alava alîkarîyê wenda bike
- dema ku kesê ev alava alîkarîyê ji tere nivîsîye û wêna paşde bixwaze û tu wêna nede